Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :426 nameronahi@gmail.com 3- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Fermana 73'yan û ji nûve vejîn





Di ser fermana 73'yan a Şengalê re 4 sal derbas bûn, lê hîn jî bi deh hezaran kes ji warê xwe dûr in, bi hezaran kes di destê çeteyan de mane. Li aliyê din gelê Şengalê ji xweliya fermanê jiyanek nû vejand.

Civaka Êzidî ku di dîrokê de bi gelek fermanan re rû bi rû ma, di sala 2014'an de vê carê li ber çavê hemû cîhanê di fermanê re hat derbaskirin. Di 4'emîn salvegera fermanê de, birînên Şengalê hîn bi temamî nehatine kewandin, lê belê civaka Êzidiyan ji êşên hilweşandin, talan, qetilkirin, revandin û îşkenceyê jiyanek nû jî afirandiye.

Gelo wê rojê çi çêbû, çi bi serê gelê Êzidî hat, çawa hatin rizgarkirin, piştî fermanê geşedanên li herêmê çibû û rewşa niha çiye?

**DAGIRKIRINA MÛSILÊ**

Çeteyên DAIŞ'ê ku ji sala 2014'an ve li Iraq û Suriyê erdîngariyek mezin dagir kir di 10'ê Hezîranê de bajarê Musulê dagir kir.

Bi vê dagirkeriyê re li ser deşta Nînowa, bi taybet jî Şengalê ku navçeyek girêdayî Musulê ye û piraniya şêniyên wê Êzidî ne xeteriyek mezin çêbû. Hêzên artêşa Iraqê ku xwe ji Musulê vekişandin, navçeya Şengalê jî vala kirin. Piştî ku hêzên Iraqê herêm vala kir,



hikûmeta Herêma Kurdistanê 12 hezar pêşmerge şandin Şengalê. Di vê navberê de çeteyên DAIŞ'ê êrîşên xwe li derdora Musulê berdewam kirin û piraniya gund û bajarokên li derdora Şengalê dagir kirin. Bi vî rengî Şengal hatibû dorpêçkirin û êdî çeteyan berê xwe dabû Şengalê. Gelê Şengalê herçiqasî di nava metirsiyê de be jî, baweriya xwe bi hêza pêşmergeyan anîbû û wan jî bi çekên xwe amadekarî dikirin ku warê xwe biparêzin. Lê belê tişta ku ew difikirîn wê pêk nehat û pêşmergeyan bêyî ku gel agahdar bikin herêm vala kirin.

**FERMANA 73'yan**

Di dema ku herêm dihat valakirin de, çeteyên DAIŞ'ê jî êdî berê hemû êrîşên xwe dabûn Şengalê. Ji bilî rêya bajaroka Rebîa ya li ser sînorê Rojava, hemû rêyên Şengalê ji aliyê çeteyan ve hatibûn girtin. Ew rê jî di bin kontrola hêzên PDK'ê de bû. Di destpêka Tebaxa 2014'an de çeteyan êdî navenda Şengalê dida ber topan, lê dîsa jî destur nedihat dayîn ku welatî malên xwe bar bikin û li ser riya Rebîa derbasî herêmên bi ewle yên Başûrê Kurdistanê bibin.

Çeteyan êdî ji çar aliyan ve êrîşî Şengalê dikir û komkujî pêk di anîn. Lê hovîtiya herî mezin şeva ku 2'yê Tebaxê bi 3'yê Tebaxê ve girêdide pêk anîn. Di 2'yê Tebaxê ku civaka Êzidiyan cejna Çilê Havînê pîroz dikir de, çeteyan saet di 02.00'ê şevê de êrîşî ser gundê Sîba Şêxidir û Gir Zerik yên li Başûrê Şengalê kirin. Li van herdu gundan ciwanên Êzidî heta saetên serê sibehê li ber xwe dan û li bendê man ku



pêşmerge alîkariya wan bikin. Lê ne pêşmergeyan alîkarî kir ne jî cebilxaneya gundiyan hebû. Di encamê de jî çeteyan gundî di komkujiyê re derbas kirin.

Di dema ku çeteyan êrîşên zêde dikirin de, hêzên pêşmergeyan di saetên serê sibeha 3'yê Tebaxê de herêm bi temamî vala kir û xwe paşve kişandin. Di dîmenên ku di çapemeniyê de hatin weşandin de pêşmergeyên ku Şengal terikandin digotin, "bi biryara ji jor em paşve diçin."

Şengala ku bêparastin hatibû hiştin û gelê wê yê sivîl ketibûn nava pençeyên çeteyên DAIŞ'ê. Li gorî zanyariyan, wê demê li Şengalê 500 hezar û 750 kes diman. Çeteyan di 3'yê Tebaxê de êrîşî navenda Şengalê kirin û kî hatiba pêşiya wan qetil dikirin. Her wiha jin, zarok û mêr bi hezaran kes revandin. Êzidiyên li Şengalê ji bo ku nekevin destê çeteyan, berê xwe dan Çiyayê Şengalê. Bi sed hezaran kesên ku di nava wan de zarok, jin, pîr û kal hebûn xwe spartin çiya. Lê bi deh hezaran kesan jî nekarîbûn xwe xilas bikin û di komkujiyê re hatin derbaskirin. Bi hezaran hatin revandin, windakirin.

Derbarê komkujî, kesên hatine revandin, windakirin û îşkencekirin de heta niha agahiyên zelal nehatine diyarkirin û reqemên cuda tên dayîn. Li gorî lêkolînên ji aliyê saziyên cuda ve hatine kirin hin agahî wiha ne:

Kesên hatine qetilkirin: 1293
Zarokên bê bav mane: 1759
Zarokên bê dayîk mane: 407
Zarokên bê dayîk û bav mane: 359
Zarokên ku çarenûsa dayik û bavên wan nayê zanîn: 220



Hejmara giştî ya zarokên ku bêdayik, bê bav mane û çarenusa dayik û bavên wan nayê zanîn: 2745
Hejmara kesên hatine revandin: 6417 (Ji vana 2760 jin, 788 zarokên keç, 2869 zilam û zarokên kur in.)
Gorên komî yên hatine dîtin: 68 (ev gor hîn nehatiye vekirin)
Cihên pîroz ên hatine hilweşandin: 68

**BI SED HEZARAN KOÇBER**

Di dema fermanê de çiyayê Şengalê bibû tekane stargeha bi sedhezaran welatiyên li Şengalê û gundên wê. Ji ber ku hemû alî aliyê çeteyan ve hatibûn dorpêçkirin, ji 7 salî heta 70 salî sed hezaran kes derketin ser Çiyayê Şengalê yê ku di destanên lehengiyê de navê daye nivîsandin. Di dîmenên ku wê rojê ji aliyê çapemeniya azad ve hatin weşandin de, yek ji trajediyên herî mezin dihat dîtin.

Li gorî daneyên ji aliyê saziyên têkildar ve hatine girtin, di fermanê de 360 hezar kesan ji cih û warê xwe koç kir. Bi sed hezaran kesên xwe spartibûn Çiyayê Şengalê di dorpêça çeteyên DAIŞ'ê de bûn û xeteriya komkujiyê li ser wan hebû...*Îbrahîm ÊZIDÎ /Şengal*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 426 3 - Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Tirkiyê koalîsyona çeteyan ava kir

Li Idlibê, çeteyan bi piştgiriya dewleta Tirk koalîsyoneke din ava kirin. Hat zanîn piştî civîneke ku di bin sponsoriya MÎT'a Tirk de ku du hefteyan li Îdlibê dewam kir, hate ragihandin ku komeke din bi navê El-Cebhe El-Weteniya hate avakirin. Kom ji tevlêkirina El-Cebhe El-Weteniya, Cebhet Tehrîr Sûriye, lîwayên Siqûr El-Şam, Ceyş El-Ehrar û Tecemu Dîmeşq pêk tê. *R-2*



# MIROVAHÎ DEYNDARÊ ÊZIDÎYAN E

*3'yê sibata 2014'an çeteyên DAIŞ'ê êrîşî cih û warên pîroz yên Êzidiyan Şengalê kirin û bi hezaran Êzidî revandin û qetilkirin. Bi hezaran pêşmergeyên PDK'ê qaşo ku parastina Şengalê dikirin reviyan û gelê Êzidî di nava lepên DAIŞ'ê de hiştin. Bi boneya salvegera fermana 74'an rêxistinên kurd daxuyanî dan û girîngiya parastin û statuyan gelê Êzidî destnîşan kirin.*



### DIVÊ NASNAMEYA ÊZIDÎYAN WERE PARASTIN

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Êzidiyan a 3'ê Tebaxa 2014'an daxuyaniyek da û diyar kir ku her kes bi navê mirovahiyê deyndarê Êzidiyan e. KCK'ê got, "Hemû mirovahî bi taybetî jî Kurd, bi parastin û ewlekirina ziman, çand, bawerî, hebûn û nasnameya Êzidiyan dikarin vî deynê xwe bidin." *R-5*

### DIVÊ ŞENGAL XWESER BE

Konseya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera 4'an a Qirkirina Şengalê ku 3'ê Tebaxa 2014'an bi destê çeteyên DAÎŞ'ê hate kirin, daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku birîna Şengalê wê bi avakirina yekîtiya netewî bikewe. KNK'ê got, "Ji bo ku Şengal xwe biparêze divê Şengal xwedî statûteyek taybet û xweser be." *R-4*

### DIVÊ HER KES TEVLÎ ÇALAKIYAN BIBE

KONGRA GEL, bi wesîleya salvegera çaremîn a qirkirina 3'ê Tebaxa 2014'an li Şengalê li civaka Êzidî hate kirin daxuyaniyeke nivîskî weşand. KONGRA GEL bi bîr xist ku ji bo şermezarkirina Qirkirina 3'ê Tebaxê û daxwaza qebûlkirina statuya Şengalê, wê li çar aliyên cîhanê çalakî bên lidarxistin û ji bo van çalakiyan banga tevlîbûnê kir. *R-5*

### EMÊ MÎNA ŞENGALÊ VEGERIN EFRÎNÊ


Bi boneya 4'emîn salvegera komkujiya Şengalê, Meclisa Rêveber a Efrînê daxuyaniyek da wiha got, "Ji Şengalê heta Kobanê, Nisêbîn û Efrînê, komkujî yek e û ji heman jêderê pêk tên. Em wek welatiyên Berxwedana Serdemê li herêma Şehbayê emê li ber xwe bidin heta weke welatiyên Şengalê em vegerin ser axa xwe." *R-5*

## Li Efrînê jin dibin hedefa êrîşan

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin herî zêde jî êrîşî jinan dikin. Dagirker jinan direvînin, destdirêjiyê li wan dikin û dikujin. Li gorî daneyan, di êrîşên li dijî Efrînê de heta niha 38 jin hatin qetilkirin, 81 jin hatin birîndar kirin û 25 jin hatin revandin. *R-3*



## Tirkiye li Efrînê dagirker e



Li gorî raporeke Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, şêniyên Efrînê dan xuyakirin ku binpêkirina mafên mirovan ên bi destê komên çete ên Tirkiyê ve tê kirin zêde dibin. Rêxistinê bang li tirkiyê kir ku tavilê dawî li binpêkirina mafên mirovan bîne û destnîşan kir, Tirkiye ku weke 'hêza dagirker bi nav dike' ji bûyerên li Efrînê diqewimin berpirsyar e. *R-5*

## Dagirkeran 9 sivîlên din li Efrînê revandin



Her roja ku derbas dibe kiryarên hovane yên dagirkeran li Efrînê li dijî welatiyên sivîl zêdetir dibin. Leşker û çeteyên Tirk ên dagirker li navçeya Mabata ya Efrînê êşkence li 9 sivîlan kirin û ew revandin. Agahî ji sivîlên hatin revandin nayê girtin. *R-2*

## Rejîma Sûriye 3 parêzgeh kontrol kirin



Generalê Rûsya Sergeya Rûdskoy ê li Moskovayê axivî got: "Hêzên rejîma Sûriyê bi desteka hewayî ya Rûsya koma çeteyên DAIŞ'ê û El Nûsra ya berê bi temamî îmha kiriye, parêzgehên Dera, Sûweyda û Quneytrayê xistine di bin kontrola xwe." Rûdskoy destnîşan kir ku rejîma Sûriyê sînorê di navbera Urdun û Sûriyê de jî kontrol kiriye. *R-2*

## HSM wê buroyên xwe li başûrê Sûriyê veke




Partiya Pêşerojê ya Sûriyê bi welatiyên bajarokê El-Curniyê yê Tebqayê re civînek lidarxist û bi dehan welatî beşdarî civînê bûn. Serokê rêxistina Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya herêma Tebqayê Mesna Ebdilkerîm di civînê de axivî û diyar kir ku wê buroyên partiya xwe li başûrê Sûriyê vekin. *R-2*

## Li Îranê çalakiyên gel mezin dibin

Çalakiyên gel li Îranê berbelav û mezin dibin. Li Li bajarê Îsfahanê yê Îranê çalakiyên protestoyê yên ji ber buhabûn, qutkirina av û elektrîkê geştir dibin û li gelek bajarên din jî belav dibin. Li Tehran û Meşedê jî gel daketin kolanan û çalakiyên protestoyê li dar xistin. *R-2*



## Emerîka'yê firotina F-35 ji bo Tirkiyê rawestand



Piştî ku Wezareta Xezîneyê ya DYA'yê biryara pêkirinê li ser du wezîrên Tirk da, rawestandina balafirên şer F-35 jî pejirand. Pêşnûmeya yasayê heftêya borî ji aliyê Meclîsa Nûneran ve, li dijî 10 dengan bi 87 dengan hate qebûlkirin. Ev pêşnûmeya ku hatî qebûlkirin Serokê DYA'ê Donald Trûmp jî îmze kir û bû yasa. *R-2*

## Heta ku Brûnson bê berdan wê pêkanîn bidomin

DYA'yê ku ji ber krîza girtina rahîb Brûnson li dijî du wezîrên AKP'yî biryara pêkanînê da, hişyarî da ku pêkanîn wê bidomin. Alîkarê Serokê Emerîka Mîke Pence hişyarî da serokê rêjîma Tirk Erdogan û got, eger rahîb Andrew Brûnson neyê berdan wê pêkanînên nû bên ferzkirin. *R-2*

# Tirkiyê koalîsyona çeteyan ava kir

**Li Idlibê, çeteyan bi piştgiriya dewleta Tirk koalîsyoneke din ava kirin. Hat zanîn piştî civîneke ku di bin sponsoriya MÎT'a Tirk de ku du hefteyan li Îdlibê dewam kir, hate ragihandin ku komeke din bi navê El-Cebhe El-Weteniya hate avakirin. Kom ji tevlêkirina El-Cebhe El-Weteniya, Cebhet Tehrîr Sûriye, lîwayên Siqûr El-Şam, Ceyş El-Ehrar û Tecemu Dîmeşq pêk tê.**



Li Idlibê ku rejîma Sûriyê ew kiriye hedefa xwe, çeteyan bi desteka dewleta Tirk koalîsyoneke din ava kirin.

Li gorî agahiyan piştî civîn û lêkolînên bi sponsoriya îstixbaratên Tirkiyê ku 2 hefteyan di navbera komên çete yên girêdayî artêşa Tirk a dagirker li Idlibê dewam kir, hate ragihandin ku komeke din bi navê El-Cebhe El-Weteniya hate avakirin. Kom ji tevlêkirina El-Cebhe El-Weteniya, Cebhet Tehrîr Sûriye, lîwayên Siqûr El-Şam, Ceyş El-Ehrar û Tecemu Dîmeşq pêk tê.

Di civînê de hate destnîşankirin ku wê herêmên Cebel El-Ekrad, Cisir El-Şixûr, El-Letmana û Raşîde di nava wan komên çeteyan de werin parvekirin.

Her wiha serçeteyê çeteyên Ceyş El-Ehrar Ebû Salih El-Tehan di daxuyaniyeke fermî de li ser navnîşana xwe ya Twitterê diyar kir ku mezintrîn komên çete li Idlibê di 'laşekî' de kom dibin. Ev yek piştî daxuyaniya dawîn a civîna Astanayê ku di 30-31'ê Tîrmehê de li Soçiyê ya Rûsyayê hate lidarxistin, pêk hat.

Tê zanîn ku Ebû Salih El-Tehan têkiliyên wî bi çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nûsra) re pir baş in. Her wiha heta dawiya sala 2017`an bi çeteyên Ceyş El-Ehrar ên di bin sîwana çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam de xebitî.

## Senatoya DYA'yê rawestandina F-35 a li ser Tirkiyê pejirand



Senatoya DYA'yê pêşnûmeya yasayê ku dane balafirên şer F-35 a ji bo Tirkiyê radiwestîne, pejirand.

Piştî ku Wezareta Gencîneyê ya DYA'yê biryara pêkirinê li ser du wezîrên Tirk da, rawestandina balafirên şer F-35 jî pejirand. Pêşnûmeya yasayê heftiya bihurî ji aliyê Meclîsa Nûneran ve, ku baskê jêr a Kongreya DYA'yê ye, hatibû qebûlkirin. Pêşnûmeya ku hatî ber destê senatoyê li dijî 10 dengan bi 87 dengan hate qebûlkirin. Senato ji 100 kursî pêk tê.

Di pêşnûmeyê de rayeyê dide Wezareta Berevaniyê ku 7.6 milyar dolar ji bo balafirên şer F-35'an were xerckirin, ku balafir ji hêla şîrketa DYA'yê Lockheed Martîn ve tê hilberandin. Di nav şîrîkên vê şîrketê de Tirkiye jî heye. Lê pêşnûmeya têkilî sala darayî ya 2019'an a bi 717 milyar dolarî ya wezaretê, bi xaleke wiha ye ku derfetê dide ku balafirên şer ên navborî nedin Tirkiyê.

Pêşnûmeya ku hatî qebûlkirin şandin ber destê Serokê DYA'ê Donald Trûmp. Piştî ku Trûmp jî îmze kir û bû yasa, herî dereng di nav 90 rojî de tê payin ku raporeke derbarê têkiliya DYA ûTirkiyê de were amadekirin. Heta ku rapor biçe Kongreyê wê ne pêkan be ku F-35'an bifiroşin Tirkiyê. Di pêşnûmeyê de peymana di navbeyna Tirkiyê û Rûsyayê de, ya li ser pergala berevaniya hewayî S-400 û girtina Keşeyê Amerîkî Andreew Brûnsun tê destnîşankirin.

## HSM wê buroyên xwe li başûrê Sûriyê veke



Serokê rêxistina Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya herêma Tebqayê diyar ku wê navendên xwe li herêmên başûrê Sûriyê vekin.

Partiya Pêşerojê ya Sûriyê di civîneke xwe de bi welatiyên bajarokê El-Curniyê yê Tebqayê re ragihand ku wê buroyên partiya xwe li başûrê Sûriyê vekin.

Di civînê de ku bi dehan welatiyên herêmê beşdar bûbûn, serokê rêxistina Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya herêma Tebqayê Mesna Ebdilkerîm wiha got: "Partî hê jî banga diyaloga Sûrî – Sûrî dike û banga têkoşîna aştiyane li hemû aliyan dike ku dixwazin çareseriyeke siyasî peyda bikin."

Mesna Ebdilkerîm di axaftina xwe de diyar kir ku tu rastiya gotegotên herêmên ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê rizgar kirine wê radestî rêjîmê bikin, tune ye.

Ebdilkerîm di berdewama axaftina xwe de diyar ku partiya wan wê navendên xwe yên nû di van rojên pêş de li bajarên Siwêda û Dûmayê veke.

## Rejîma Sûriye 3 parêzgeh kontrol kirin



Li gorî artêşa Rûsya rejîma Sûriyê, Dera, Quneytra û Sûweyda yên dikevin başûrê welat bi temamî kontrol kirine.

Generalê Rûsya Sergeya Rûdskoy ê li Moskovayê axivî got: "Hêzên rejîma Sûriyê bi desteka hewayî ya Rûsya koma çeteyên DAIŞ'ê û El Nûsra ya berê bi temamî îmha kiriye, parêzgehên Dera, Sûweyda û Kûneytrayê xistine di bin kontrola xwe."

General ji bo operasyona li herêmê pênaseya 'operasyoneke cuda' kir, diyar kir ku hêzên hikûmetê bejahiyeke bi qasî 3.332 km û 146 herêmên jîngehî xistine di bin kontrola xwe.

Rûdskoy destnîşan kir ku rejîma Sûriyê sînorê di navbera Urdun û Sûriyê de jî kontrol kiriye û got: "Ji bo Hêza Aştiyê ya NY'yê xebatên xwe yên li ser girên Golanê bike merc hatiye afirandin."

Wezîrê Karê Derve Sergey Lavrov jî daxuyaniyek da û bibîr xist ku bi taybet li herêma Îdlibê 'dawî anîna terorîstan' ferz e.

## Heta ku Brûnson bê berdan wê pêkanîn bidomin



DYA'yê ku ji ber krîza girtina rahîb Brûnson li dijî du wezîrên AKP'yî biryara pêkanînê da, hişyarî da ku pêkanîn wê bidomin.

Alîkarê Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Mîke Pence hişyarî da Recep Tayyîp Erdogan û got, eger rahîb Andrew Brûnson neyê berdan wê pêkanînên nû bên ferzkirin. Pence got, "Hikumeta DYA'yê pêkanînên giran ên aboriyê li ser Tirkiyê ferz kir. Û hikumet (DYA), heta ku Serokkomar Erdogan û hikumeta Tirk rahîb Brûnson berde û ev mirovê bêguneh ê dînî vegere DYA'yê, wê pêkanînên xwe bidomîne."

Rêveberiya DYA'yê dabû xuyakirin ku wan derbarê Wezîrê Karên Hundir ê Tirk Suleyman Soylû û Wezîrê Edaletê Abdulhamîd Gul biryara pêkanînê dane. Li gorî daxuyaniya Wezareta Xezîneyê, Soylû û Gul ji binpêkirina giran a mafên mirovan berpirsyar in, lewma ketine ber pêkanînan.

## Li Îranê çalakiyên gel mezin dibin



Li Îsfahanê yê Îranê çalakiyên protestoyê yên ji ber buhabûn, qutkirina av û elektrîkê geştir dibin.

Li Îsfahanê çalakî di roja sêyemîn de didomin û li gelek bajarên din jî belav dibin.

Li navçeya Şapûr Cedîd a Îsfahanê roja Çarşemê çalakî hatin lidarxistin û sloganên 'Hamaney biteqize', 'Ji dîktator re mirin' û 'Dijminê me li vir e, ne Amerîka ye' hatin berzkirin.

Hêzên rejîmê bi bombeyên gazê mudaxeleyê çalakgeran kir û ciwanan agir dadan. Li hin kolanan, hêzên rejîmê ji neçarî bi paş ve vekişiyan.

Li kolanên Emîr Kebîr, Muşhîr El Duwleh û Hazardestanê di navbera çalakgerên Îsfahanê û hêzên dewletê de şerekî giran çêbû.

Li Îsfahanê çalakî di roja sêyemîn de didome û hate diyarkirin ku hêzên dewletê gelek kes destgîr kirine.

Li Tehran û Meşedê jî gel daketin kolanan û çalakiyên protestoyê li dar xistin.

## Dagirkerna 9 sivîlên din li Efrînê revandin



Leşker û çeteyên Tirk ên dagirker li navçeya Mabata ya Efrînê êşkence li 9 sivîlan kirin û ew revandin. Agahî ji sivîlên hatin revandin nayê girtin.

Li gorî nûçeya ANHA'yê, çeteyên Sûltan Mûrad û Tabûra 112'an a ser bi Enqereyê ve, li gundê Damiliya yê navçeya Mabatayê 9 sivîl revandin ku yek jê jin e. Sivîlên hatine revandin: Seydo Silêman Hîcî (25), Newaf Welîd Elo (18), Avdar Rıfat Elo (18), Çeger Hisên Abdullah (35), Mihemed Elî Hîcî Umer (65), Ehmed Mehmûd Hemo Ebû Cebel (35), Elî (65), Fatime Fexrî Elî (49), Fexrî Qadir Elî (35).

Li gorî agahiyan, êşkence li sivîlan hatiye kirin û li ser aqûbeta wan niha ti agahî nîne.

ANHA'yê li ser mijarê dîmen weşand û tê de xuya dike, sivîlek hatiye tazîkirin, ji pişt ve destên wî hatine girêdan û bi pihîn û ço li wî dixin.



# Kurdan bi dengbêjiyê çanda xwe parast

**Dengbêj Naîf Munisî yê ji gundê Munisî yê navçeya Hezro ya Amedê ji 8 saliya xwe ve bi rengekî bê navber klamên dengbêjiyê dibêje. Dengbêj Naîf Munisî ku bi sedan kilamên wî hene dibêje, dengbêjî çand û dîroka Kurdan e.**



Dengbêj Naîf Munisî ku bi sedan kilamên wî hene dibêje, dengbêjî çand û dîroka Kurdan e.

Dengbêjî vegotina dîroka Kurdan e ku îro jî di nava çand û hunera Kurdan de xwedî cihekî taybet e. Yek ji şopdarên vê çandê Haîf Munisî ye. Dengbêj Naîf Munisî li gundê Munisî yê navçeya Hezro ya Amedê sala 1969'an ji dayik bû. Ji 8 saliya xwe ve bi rengekî bê navber klamên dengbêjiyê dibêje.

Dengbêj Naîf Munisî sala 1968'an tevî malbata xwe li Sûrê bi cih bû. Di çûkaniya xwe de tevî kalkê xwe li dîwana dengbêjan timî guh da kilaman.

### DENGBÊJÎ DÎROKA GELÊ KURD E

Munisî diyar kir ku dengbêjî çanda gelê Kurd e û wiha dewam kir: "Bi saya dengbêjiyê Kurd hîn jî dikarin çand, huner û dîroka xwe biparêzin. Dengbêjî çanda gelê Kurd e. Em Kurd bi dengbêjiyê qala dîroka xwe dikin. Bi dengbêjiyê qala şer, çîrok, eşq û destanên xwe dikin. Dengbêjan hest û dengê Kurdan ji dîrokê ve gihandine serdema heyî. Dengbêjan wêje û dîroka Kurdan a nehatiye nivîsandin, bi deng û hunera xwe parastine û gihandine vê demê."

### KILAMÊN HERÊMÊN SERHED, AMED Û BOTANÊ DIBÊJE

Munisî anî ziman ku kilamên dengbêjên herêmên Serhed, Amed û Botanê gelekî bandor li wî kirine û hîn zarok bû biryar daye ku bibe dengbêj. Munisî got, di nava dengbêjan de yên herî zêde bandor li wî kirine Dengbêj Salihê Beynatê, Huseyîn, Tayip Sêrtî û Şakiro ne. Munisî destnîşan kir ku dengbêjî vegotina êş, kêfxweşî, eşq, koçberî û gelek bûyerên bi vî rengî yên bi serê Kurdan ve hatiye û wiha dewam kir: "Ez ne tenê kilamên Amedê dibêjim. Kilamên herêmên Serhed, Botan û Xerzanê jî dibêjim."

### DENGBÊJÊ GEL IM

Munisî diyar kir ku ew dengbêjê gel e û got, "Bi sedan kilamên min hene ku min bi xwe çêkiriye. Ez dengbêjê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan im. Weke hinekan ez ne stranbêjê Erdogan an jî yê dewletê me. Ez ji gel re distirêm. Gel dixwaze, ez jî distirêm. Li ser Tevgera Azadiyê ya Kurd, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û HDP'ê min bi dehan kilam amade kir. Min bi kilamên xwe hewl da bûyerên li vê herêmê qewimîne vebêjim. Ev dengê dilê min e, daxwaza gelê min e."…*Denîz ÎKE*

## Pêşengeha alavên kevn hat vekirin



Di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê de, pêşengeke alavên kevin li navçeya Şêrawayê hate vekirin vekir.

Di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê de ku ji aliyê Tevgera Tevana Zêrîn a herêma Efrînê ve hatiye organîzekirin pêşengeheke alavên kevin li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa ya Efrînê bi amadebûna sedan kesî hate vekirin.

Komên girêdayî Desteya Çand û Hunerê stran, dîlan û helbest di pêşengehê de pêşkêş kirin.

Endama Tevgera Kevana Zêrîn Emel Îbiş diyar kir ku di nava mehekê de amadekariyên vekirina pêşengehê hate kirin û destnîşan kir armanca sereke ya vekirina pêşengehê çanda Efrînê were naskirin û ji hewldanên tunekirinê were parastin.

Pêşengeh ji destar, fanos, cil û bergên Kurdî yên jinan, hawin û hwd, pêk dihat…*ANHA*

## 15'ê Tebaxê hêz da, hestên muzîk û strana şoreşgerî



**Hozan Seyîdxan**

Muzîk dayîna der a hestên civakê bi deng e. Her wiha ji destpêka dîroka şaristaniyê ve jî heye. Şewazekî vergerîna şahî, êş û bûyerên jiyana civakê eleqedar dikin û destana a melodiyê ye. Yekser bandorê li hestê dike. Bi vî aliyê xwe muzîk ji jiyana mirov û civakê cuda nikare were fikirîn. Ji ber ku modernîteya kapîtalîst vê yekê dizane ji bo rêvebirina bijarte û hestên mirovan gelekê ji muzîkê sûdê werdigire. Tiştê ku modernîte dixwaze bike ewe ku kes ji dîrok, nirxên civakî qut bike li gor civaka şahî û pêşandanê li ser bingehê tevkujiya çandî asîmile bike û bihelîne. Ji ber ku di civaka pêşandanê de afrînerî tune ye, teqlîd heye. Ev jî tê wateya wergerandina tolazî a kesayet û civakê. Di bingehê wê de derbaskirina demên xweş heye. Berovajî vê yekê di klam û stranên me de rastiyeke dîrokî û exlaqê civakî heye. Xitabî hestê mirovan dike. Her pêngavek di soresan de dibe sedema xwe guhertîna serdemekê,mînak, civak, ramyarî, bîrdozî, û her wihajî hunera stranbêjiyê.Bi pêsengiya soresa azadiyê re. berxwedana 1982,an ya li zindana Amedê bû cavkaniyeke hêzdayin û pêşxistina strana şoreşgerî ya berxwedêr.Tevî ku beriya derketina şoreşa vejînê, bi dehan hunermend û dengbêjan di stran û hunera xwede pesinê delaliya kurdistanê pir dane lê dîsan jî ji ber gelek sedem û egerande di xêzeke pir teng ya devkî û heremî de mabû. Lê tevlî van tengasî û astengiyan dîsa ev berhemana hetanî bi vê roja ku em tê de dijîn weke miras û çavkaniyeke resen ji me hunermendan, û nifşan re maye.

Bi pêngava vejîna 15,ê tebaxê re berê stran û muzîk a şoreşgerî kete qonaxeke din li gel ku gelek hunermend û stranbêjên wê serdemê, di serîde koma berxwedan ku hîna di destpêka salên tekoşînê de, berhemên hunerî yê alternatîf afirand, pêre jî misyonek şoreşgerî jî girte ser milê xwe, bi vê misyonê re pêşî li takakesîtiya aloz û bê rêxistinkirî girt.

Helbet ji destpêka tekoşînê de, rastiya kû hişt koma Berxwedan û hunermendên soresger rola xwe bilîze, bibin dengê gel û şoreşê, her weha, bibe sedema pêşxistinê, bê guman girêdana bi tekosînê re û bi ked û xebata Şehîd Sefkan, Mizgîn û heta ya gelek hunermendên şehid bû. Ev mînak, di heman demê de, li dijî bandora modernîteya kapîtalîste, li dijî takakesîtiya popîlîst ya li hemberî kolektîfizimê bû ye bersivek bingehîn!.

Îro gelê me, li rojavayê kurdistanê şoreşa gel, bi awayekî awerte û hunerî roj bi roj mîna tevnê, bi ked û ronahiya çavan tê neqişkirin, birê ve dibe û bingeha dehatuya azad diafirîne.Ev şoreşa ji aliyê hemû kurdan ve wek rojeva sereke tê pejirandin.

Bi kurtî weke ku li jorê jî hatiye dest nîsankirin , divê hemû hunermendên stranbêj ji kurt û kêmasiyan xwe rizgar bikin û hunera strana soresgerî û çanda otantîk ya resen, ji xwere bikin bingeh bi pêş bixe, û careke din li rastiya diroka xwe ya berxwedêr vegerin, di eniya çand û hunerê de, bibin dengê şoreşa nuh.

Li ser hîmên rêhevaltiya Sehid Mizgîn,Sefkan û Serhedan xwe ji nuh de, bi hêz û rêxistin bikin û li ser vê bingehê bibin stran û dengê netewa demokratîk ya azad.

## Civak ji arabeskê bê paqişkirin



**Rotînda YETKÎNER**

Ger em bi çavek lekolînvanê cîvaknasî li rewşa cîhanê binêrin, Rewşa tevahî civakên cîhanê di warê çanda nûjende gelek lewaz û şelûye. Gelek sedemê ve rewşê hene lê li gor min sedemên bingehîn, par nehîştina çand û hunerêye. Hêzen cîhanê ên gire gir, di warê sîyaseta ku tê meşandin hunerê wekê beşekê sanayî dibîne û li gor wê tevdigere. Dema roldayîna hunerê wek beşek ji sanayiyê be, ew dem berhemên huner dibe wekê berhemên meta ên fabriqayan. Naxwazim zêdetir li ser rewşa hunera kapîtalîzm bisekinim, mexseda min ji vê mînakê ewe kû, em jî ketine bin badora ve çanda fabrîkasyonê.

Ji salî 1990 şûnde, Tekoşîna Azadiyê bi xurtayî li ser civaka Kurdistanê bandorekê tûj, guhertinên mezin afirand. Ev şoreş bi cangorîtiya jin û mêrên leheng, rê li ber ronîkirina civaka kû gelek paşmayî hîştin vekir.

Lê dijminê kurdan ên tu zagonên navnetevî nenas û bi hovitiyek mezin bi ser gelê Kurdistanê de şerê qirêj dimeşandin, bi vê hovitiya xwe di civakê de çanda şerê qirêj jî da afirandin. Tekoşîna Azadiyê di vê warê de zêdetir nedikarî bibe bersiva resen û rast, ji ber ku şerê mayîn û nemayînê dimeşand. Siyaseta rojanê jî, mecbûr dima kû piranî li ser propoganda tekoşîna tûj û vala derxistina derew û hîleyên dijmin rawestiya.

Her waha di nava propogandayên dijmin ên qirêj û derew de û a şoreşa Kurdistan ji bo serxwebûn û azadiya gelan de, huner tenê bi berhemên rojan bû bersiv.

Ev bersiv ji bo dema kurt dibe kû encamen erênî biafrîne, lê di demdirêjiyê de wê gelek xirabiyên mezin daxe nava çanda civakê.

Dema îro de em van xirabiyan dibînin, lê dive em bê rawestan li dij van xirabiyan derkevin û berya kû bêtir qirêjkirina huner û çanda civaka me, divê em bersivên resen û rast biafrînin.

Yekem divê em di dibistan û tevgerên çandî de raste rast guftugoyên tûj li ser vê rewşa huner hunandina nerast bisekinin û nebêjin ev kes wê behşê, filankes bixeyîde. Em biryarên tûj bistînin ku, bila zarokên me ji vê hunera arabesk dûr bimînin.

Televzîyon û radyo û komelên me divê xwe ji bandora çanda arabesk, postmodern û kesên takakesiya xwe dane pêş xwe rizgar bikin.

Çand û huner ne ji bo popîlîzma kesane û ne jî rêya qezenc kirina perane, çand û huner divê ruh asekirina civakê be.

Di civîn, konferas û kongreyan de, bêtirê biryar stendinan, divê hunera resen û çanda şoreşê di jiyana civakê de bête çandin. Ev çandina resen bi riya kesayetên kû ne di bandora arbesk an jî postmodern da bête pêkanîn.

Kesên kû bi salan muzîka arabesk gotine, ne mumkune kû ew ji nivşên nû re bikaribe bibe mînakên rast. Divê em qada çand û hunerê ji van kesayetan azad bikin.

Çanda kû di ruhê Mazlum, Berîtan, Egît û Arîna de hatî afrandin, divê bi kesayetên akademîk bête pêşxistin.

# Li hin taxên Qamişlo pirsgirêka avê

**Li hin taxên bajarê Qamişlo yên mîna Qudûrbeg, Rojav û El Siyahî di demên dawîn de pirsgirêka avê rûdaye. Şêniyên taxan ji ber vê pirsgirêkê bi gazinc in. Hevserokê Muduriyeta Ava Giştî ya Qamişlo Vînda Hesen diyar kir ku pirsgirêka avê di van demên dawîn de zêde bûye û got, "ji bo çareseriyê me proje pêşxistine."**

Li hin taxên bajarê Qamişlo di demên dawîn de pirsgirêka avê rûdaye. Şêniyên taxan ji ber vê pirsgirêkê bi gazinc in.

Di van demên dawîn de li hinek taxên bajarê Qamişlo pirsgirêka qutbûna avê derket. Şênî ji ber vê pirsgirêkê zehmetiyan dikişînin. Aliyên têkildar sedema vê pirsgirêkê bi tunebûna hilmijên ku dikarin avê biavêjin wan taxan ve girê didin. Taxên ku av lê qut bûne ev in; taxa Qidûrbek, taxa Rojava û taxa El-Siyahî.

Hevserokê Komîna Şehîd Lewend a taxa Qidûrbek Ehmed Ferhan destnîşan kir ku şênî ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe yên derbarê qutbûna avê de serdana komînê dikin.

Ji ber qutbûna avê şêniyên taxan neçar dimînin ku avê ji sarîncan bikirin. Welatiya bi navê Hemdiyê Xelîl Mehmûd diyar kir ku ew ji ber qutbûna avê, xezana avê bi buhaya 2 hezar lîreyên Sûriyê dikirin.



Ehmed Ferhan diyar kir ku wan rexne û giliyên şêniyan ji aliyên têkildar û meclisa kantonê re pêşkêş kirine û got: "Aliyên têkildar soz dan ku wê xetek avê ji bîra Gulistana Şehîdan a taxa Qidûrbek ji taxê re bikişînin."

Hevserokê Miduriyeta Ava Giştî ya Qamişlo Vînda Hesen diyar kir ku pirsgirêka avê di van demên dawîn de zêde bûye û bi taybet li taxên Qidûrbek, El-Siyahî û Rojava. Vînda diyar kir ku wan piştî ji bo çareserkirina pirsgirêkê proje danîne…*ANHA*

## Zeviyên pembû li ber telefbûnê ne

Cotkarên pembû yên Tebqayê, di xirabtirîn demsaleke pembo de ne. Kurmika El-Loz nêzî ji sedî 70 berhema pembo telef kiriye û her wiha derman kêm in û yên heyî jî sûdewar nîn in.

Pembo li herêma Tebqayê li ser beravên çemê Firatê tê çandin. Bi sedan hektarên ku bi pembo hatine çandin ji ber kurmika El-Loz telef dibin.

Midurê Komîteya Çandiniyê li bajarokê El-Mensûra li herêma Tebqayê Ebdulselam Ehmed wiha got: "Hilberîna pembo li bajarokê El-Mensûra ji ber gelek kurmikan wekî kurmika El-Loz gelek ziyan dîtiye."

Kurmika El-Loz, kulîlka pembo dixwe û hêkên xwe tê de dike û piştî demekê ew hêk dibin kurmik û kulîlkên pembo dixwin, heta tovê pembo dimire. Bi vî awayî cotkar hilberînê ji ber telefbûnê berhev nakin.

Tunebûna dermanên kurmikan ên bi kalîte li sûkên herêmê û tunebûna çavdêriyê li ser dermanên ku ji derve tên, dibin sedema belavbûna nexweşiyan di nav berhema pembo de.

Ehmed tekez kir ku dermanên ji bo hilberîna pembo hatine bikaranîn tu zirar negihand kurmikê lê belê karê cotkaran zêde kir û diyar kir ku rêjeya zirardîtinê ji sedî 70 ye.



Midurê Komîteya Çandiniyê ya bajarokê El-Mensûra tekez kir ku eger ev rewş berdewam bike û kurmika El-Loz tune nebe, wê hemû hilberîn di çend hefteyan de telef bibe…*ANHA*

## Ji bo parastina çandî, çalakiya piştgiriya derûnî



**Idrîs HENAN**

Zarok û dayik di şeran de dibin mexdûrê yekemîn. Dema ku projeyek derûniya wan biparêze tune be, derhal têk diçin û ji sazî û rêxistinên dît re dibin rûpelek spî ku tişta dixwazin li ser dinivîsin. Ji bo rê li ber vê têkçûna derûnî ya dayik û zarokê Efrînê bê girtin, Heyva Sor a Kurd li Şehbayê bi riya komîteyeke taybet projeya Piştgiriya Derûnî da destpêkirin.

### ZAROK HEDEF TÊN GIRTIN

Endama Komîteya Piştgiriya Derûnî ya Heyva Sor a Kurd li Şehba Henan Mihemed derbar projeyê de ev agahî bi me re parve kir û got: Em di wê têgihaştinê de bûn ku ji bo piştgiriya gelê Efrînê tenê şîr, xwarin û vexwarin têrê nake. Pêwîst dikir bernameyek me ya piştgiriya derûnî ji zarok û dayikan re hebûya. Lê mixabin derfetên me kêm bûn. Ji ber vê jî em dereng man. Kêmderfetiyê wê rê li ber hinek rêxistinên din vekiriba ku zarokên me hedef bigirin. Di aliyê çandî de zarokên me li beramberî xeteriyeke cidî bûn.

### JIN Û ZAROK MEXDÛR IN

Mihemed projeya Heyva Sor a Kurd wiha rave dike: Di şer û pevçûnan de herî destpêkê derûniya zarok û dayikan bandor dibe. Dayik di vî şerî de yan bê kar maye yan zarok, mêr, bira û bav şehdî bûne. Gelek zilaman jî malbatên xwe li pey xwe hiştine. Li kêleka van jî bandora koçberiya bi zorê bi xwe heye. Ji ber vê em fikirîn; ger em nikarin çareser bikin, bi kêmanî mudexeleya derûnî ya lezgîn çêbikin. Ji ber van sedeman bi insyatîfa Heyva Sor a Kurd û bi piştgiriya Desteya Karûbarên Civakî komîteya piştgiriya derûnî ji şeş kesan hate damezirandin.

### ÇALAKÎ TENÊ LI KAMPAN E

Mihemd destnîşan kir ku wê ev çalakî meheke dirêj bike û got: Çalakiya me ya ku di 31 Tîrmehê de dest pê kiriye, ji heftê du rojên Sêşem û Pêncşemê li Kampa Serdem, Çarşem û Înê li Kampa Berxwedan bê lidarxistin. Wê weke tecrubeya me ya yekemîn tenê li herdu kampan be. Di vê mehê de wê bi rengên cuda cuda (wênexêzî, çîrokbêjî, Şanogerî, stran, spor, çalakiyên zanistî, bazdan, artîstên karton, lîstik,… hwd) çalakî bê pêşkêşkirin. Li gorî planameyê, em ê destpêkê hewl bidin guhdarî zarokan bikin, piştre wê zarok bi rêbazên taybet ji şîdetê bên dûrxistin. Dîsa wê zarok fêr bibin ku çawa mafên xwe binasin.

Ji bo dayikan jî wê semînerên ku çawa dayik bi zarokan re bide û bistîne bên dayîn. Ji bo giştî têgihaştina civakî, tendirustî û derûnî wê bi riya komîteyên me yên perwerdê çalakî hebin.


### ARMANC PARASTINA ÇANDÎ YE

Endama Komîteya Piştgiriya Derûnî ya Heyva Sor a Kurd Henan Mihemed derbarê armancên vê çalakiyê de ev tişt anî ziman: Di serî de em parastina çandî hedef digirin. Niha gelek rêxistin hene di bin navê piştgiriyê de dixwazin rewşa gelê me bi taybet zarokan biçewisînin. Em pê hesiyan ku piştftineke nerm li ser gelê me dimeşe. Em ê bi vê çalakiya xwe rê li ber vê yekê bigirin.

Mihemed dibêje ku heya niha ti aliyekî navneteweyî taybet sazî û rêxistinên eleqedarê rewşa zarokan (UNICEF) destek nedane me. Tenê saziyên Rêveberiya Xweser (Çand û Huner, Kar û Barên Civakî, Yekîtiya Rewşenbîran) piştgiriya projeya me kirine.

Hêjayî gotinê ye ku çalakiya Piştgiriya Derûnî ya Heyva Sor a Kurd bi qasî du saetan bi tevlîbûna zarok û dayîkên li kampan dimînin dewam dike. di vê çalakiyê de xwarinên zarokan, pênûs û qelemên rengkirinê li zarokan tên belavkirin.

### RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Sosyalîzm û Kapîtalîzm -4-

**Abdulah Ocalan**

Me hewl dabû em serketina hegemonîk a vî cinawirî li ser civakê di cildên berê de ji hev derxin, lewma em li vir qîma xwe pê tînin bi tenê îşaret pê bikin. Rastiya vî mikrobê kurtêlxur û xwînmij ê nexweşiya civakî yê bi vî awayî, mîna 'civaka nû ya herî pêşketî û bi ser ketî' hat nîşandan, vê yekê tevahiya zanistên civakî seqet kiriye. Ji lewra ez dibêjim, kapîtalîzm ji rejîmên rahibên Sumeran ên ku rejîmên xwe yên istismarê dikirin xwedayî, hezar carî zêdetir istismarkar e, û xebatên der barê wê de îdeolojîk in. Ew rejîmeke xwedayên bêmaske ye, ji rejîma rahibên Sumeran hezar carî zêdetir bi pîroztiyê (ya qelp û lihevçêkirî) hatiye cîlakirin û boyaxkirin. Weke heqîqet ti têkiliya wê bi zanista civakî re nîne. Bi tenê têgînên zanistî weke ekonomî, polîtîka bi hosteyî li hev tînin û berevajî dikin û vê jî mîna zanist pêşkêş dikin.

Civak di encama beridîna mîlyonan salî de û weke dewama cîhana zindiyên hê berê, weke berhemê cîhana his û aqilekî balkêş xwezayeke cuda ye. Xwedî yekparebûneke bi vî rengî ye. Gerdûneke panzdeh mîlyar salî ye (dîroka gerdûnê) ku li xwe hayil bûye. Afirandina civakê bi îstîsmariya kapîtalîst ji îdeayeke Firewn û Nemrûdan a afirandina xwedê zêdetir ti nirxekî xwe nîne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, têgîna 'civaka kapîtalîst' têgîneke şapînozkirî ye, û îdeayeke firewnî ye. Ya rast ew e, divê mirov kapîtalîzmê (bi şêweyê kapîtala fînansê hê bêhtir har bûye) weke nexweşiyeke civakî bike têgîn. Fena ku mirov zanisteke tenduristiyê pêş bixe divê behsa zanisteke sosyalîst bike ku hewl bide mirovatiyê ji destê kapîtalîzmê rizgar bike. Nêzîkatiyeke bi vî rengî wê bêhtir exlaqî be (divê wisa be) û mirov ê karibe baştir fêhm bike. Naxwe em ê nikaribin şerên pêncsed salên dawiyê, bombeya atomê, pirr zêdebûna şêniyan û hilweşîna hawîrdorê rave bikin. Hem modernîteya kapîtalîst a lîberal, hem jî varyanta wê sosyalîzma pêkhatî, klan, qebîle, qewm, ummet û heta hebûnên civakî yên xwedî xisletên netewî yên ne dewleta netewe ku weke berhemên civakên paşvemayî dibînin, divê mirov qîmeteke baş bide wan. Ev şêwegirtinên civakî yên cihêreng bûne tev bi nirx in. Li gorî diyalektîkê divê mirov di civaka neteweyî ya herî pêşketî de jî civaka klan, qebîle, eşîr û gelan pêşketî û yekparebûyî bibîne. Çawa ku elementeke hezar atomî nayê wê maneyê ku atom ji holê rabûye, berevajî tê maneya rewşa atoman a pêşketî û yekparebûyî, cudabûn û cihêrengiyên piştî civaka klan jî mirov dikare bi awayekî bi heman rengî binirxîne û ev dikare mirov bêhtir ber bi heqîqeta civakî ve bibe.

Lewma divê mirov sosyalîzmê weke panjehra kapîtalîzmê bibîne, lê hay jê hebe ku bi tenê ne ev, weke civaka herî pêşketî, yekparebûyî, azad û wekhev ên tevahiya civakên beriya wê binirxîne û mirov nirxandineke bi vî rengî li gorî heqîqeta wê dike. Civak li ser modernîteya kapîtalîst mezin nabe, berevajî divê mirov rewşa bi nexweşî ya vê modernîteyê ya weke 'qefesa hesinî' û bi kirasê 'Levîathanê' ji civaka dîrokî dûr bike û mirov dikare wê li gorî danasîna wê pêk bîne. Sosyalîzm, tevahiya dîroka şaristaniyê bi qasî kapîtalîzmê nebe jî xwe ji bermahiyên yekdestdariyên koledar ên mêtinkarî û zordestiyê yên li ser rastiya civakî têne ferzkirin bişo, hingê wê hem li ser bingehê xwe yê dîrokî bi cih bibe, hem jî bi destketiyên rojane (bi destketiyên dema têkoşîna li dijî kapîtalîzmê de) wê xwe xurt û nû bike.



# Li Efrînê jin dibin hedefa êrîşan

***Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin herî zêde jî êrîşî jinan dikin. Dagirker jinan direvînin, destdirêjiyê li wan dikin û dikujin. Li gorî daneyan, di êrîşên li dijî Efrînê de heta niha 38 jin hatin qetilkirin, 81 jin hatin birîndar kirin û 25 jin hatin revandin.***



Dewleta Tirk a dagirker û komên çete, bi kiryar, rê û rêbazên DAIŞ'ê li Efrînê tevdigerin û herî zêde êrîşî nasnameya jinan dikin. Li Efrînê jin tên revandin, tên kuştin, rastî îstîsmara zayendî tên, îşkenceyên giran li wan tê kirin û kincên reş li ser wan tên ferzkirin. Ji destpêka êrîşa dagirkeriyê li ser Efrînê heta niha bi dehan jin hatin revandin û kuştin.

Artêşa Tirk a dagirker û komên çeteyên hevkarên wê di 20'ê Çile de êrîşî Efrînê kirin û di 18'ê Adarê de jî Efrîn dargirkirin. Di êrîş û dagirkirina Efrînê de herî zêde jinên herêmê bedelên mezin dan. Di êrîşan de bi dehan jin jiyana xwe ji dest dan, rastî îstîsmar, tecawîzê û îşkenceyê hatin û hatin revandin û winda kirin. Li hemberî van êrîşan jî tevahiya cîhanê bêdeng man û çavên xwe girtin.

Li gorî daneyên berdestan, di êrîşên li dijî Efrînê de 38 jin hatin qetilkirin, 81 jin hatin birîndar kirin û 25 jin hatin revandin.

## Em ê rê nedin fermanên din



Derbarê fermana 73'an a li ser Êzidiyan jinên Êzidî yên Kampa Newrozê gotin: "Bi saya berxwedana me û şervanên me em ê tu carî nehêlin ku fermanên din çê bibin."



Çar sal li ser Fermana 3'ê Tebaxa 2014'an ya li ser Êzidiyên Şengalê re derbas bû. Bi wesîleya salvegera Fermanê jinên Êzidî yên Kampa Newrozê ya Dêrika axivîn û anîn ziman ku ew rê nadin fermanên din."

Jina bi navê Neham Elyas got: "Dema ku navê Şengalê tê gotin êşên me tê bîra me. Em ê tu carî êşa xwe û xayintiya ku li me hat kirin ji bîr nekin. Em serî natewînin. Em berxwe didin em ê berxwe bidin. Em ê her rûmeta xwe li dijî dagirkeran biparêzin."

Jina bi navê Kinê Xelîl jî wiha got: "Di fermana Şengalê de gelek jin hatin revandin, kuştin, îşkencekirin û firotin. Em ê tu carî vê yekê ji bîr nekin û ji bo fermanên nû dubare nebin em ê berxwe bidin. Di şexsê jinên Êzidî de xwestin ku rûmeta hemû jinên cîhanê bişkînin. Em ê planên qirêj ên dagirkeran vala derxînin. Dê berxwedana me bidome."…*JINNEWS*

## Yekem kluba sporê ya jinan




Jinên ciwan ên Qamişlo bi armanca werzîşê û xurtkirina têkiliyên civakî di navbera jinan de berê xwe didin yekemîn kluba werzîşê ya taybet a jinan.

Yekem kluba werzîşê ya taybet a jinan, bi navê Sîbel li bajarê Qamişlo ji aliyê Buroya Jinan a Şaredariya Gel a Xerbî di 7`ê Hezîrana 2017`an de hate vekirin. Klub ji bo xweşikbûna bedena mirovan û parastina tenduristiyê, rihetbûna psîkolojîk û zêdekirina têkiliyên jinan ên ku werzîşê dikin, xebatan dike.

Di klubê de 30 alavên werzîşê ji bo zarok û mezinan hene. Her wiha kes dikarin bi pereyên kêm xwe tê de qeyd bikin.

Klub rojane 3 saetan tê vekirin û 3 tîm têne perwerdekirin. Ya yekemîn ji temenê 8 -18 salî ye, yên duyemîn û sêyemîn jî ji temenê 18 jortirin.

Riweyda Eyo ku ji zarokatiya xwe ve werzîşê dike, rêveberiya klubê dike. Riweyda got ku klub ji bo bilindkirina moral û têkiliyên civakî di navbera jinan de ye…*ANHA*

## Buroya Jinan hate vekirin

Meclisa Sivîl a Reqayê li taxa Rimêla ya bajarê Reqayê Buroya Jinan bi merasîmekê vekir.

Endamên Buroya Jinan a Reqayê, endamên Meclisa Jinan a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê, şervanên QSD`ê, hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê û endamên Meclisa Sivîl a Reqayê beşdarî merasîma vekirina buroya jinan bûn.

Di marasîma vekirinê de li ser navên saziyên jinan axaftin hatinkirin û vekirina buroyê li hemû jinan hate pîrozkirin.

Di axaftinan de hate destnîşankirin ku vekirina buroyê wê bandorê li rêxistin û rola jinan di hemû aliyên jiyanê de bike û bi taybet jinên ereb ên ku rewşa wan û hemû mafên wan hatine paşguhkirin. Di axaftinan de hate diyarkirin ku vekirina buroyê pêngaveke ber bi xurtkirin, zanebûn û tevlêbûna jinan di hemû aliyan de ye.

Di berdewama axaftinan de hate gotin ku wê Buroya Alîkariya Jinan projeyan ji bo pêşxistina jinan pêk bîne.

Di axaftinan de hat diyarkirin ku bajarê Reqayê bi xwîna şehîdên ku efsaneyên dîrokî li hemberî zilma çeteyên DAIŞ`ê meşandin, hate rizgarkirin û hate gotin ku Meclisa Jinan a taxa Rimêla wê ji bo çareserkirina hemû dozên jinan bixebite.

Paşê deriyê buroyê ji aliyê endamên Meclisa Malbatên Şehîdan a Reqayê ve hate vekirin…*ANHA*

## Mala Jinan xebatên girîng dike



**Rojane bi dehan jin ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe serdana Mala Jinan a bajarokê Til El-Simin ê Reqayê, dikin.**

**Piştî rizgarkirina bakurê gundewarên Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê jiyan hêdî hêdî vegeriya bajêr. Komîteya Jinan a Meclisa Sivîl a Reqayê di 1'ê Sibatê de li bajarokê Til El-Simin ê bakurê Reqayê, Mala Jinan vekir. Mal bi armanca vegerandina hemû mafên jinan ku di dema DAIŞ'ê de ji destê wan hatibûn birin û her wiha ji bo çareserkirina pirsgirêkên wan hate vekirin.**

**Rojane bi dehan jinên herêmê serdana Mala Jinan a bajarokê Til El-Simin dikin. Mala Jinan ji destpêka avakirina wê ve bi dehan doz çareser kirine.**

**Endama rêveber a Mala Jinan Wezîre Mihemed diyar kir ku ew ji bo piştgiriya jinan di hemû aliyên parastin, alîkarî, perwerdeyê de xebatan dimeşînin.**

**Wezîre destnîşan kir ku jinên herêmê ji ber rewşa dijwar ku tê re derbas bûne û ji ber qanûnên DAIŞ'ê, jinên bi kesayeteke lewaz ku nikarin mafên xwe bistînin, afirandin. Ji ber wê Mala Jinan a Til Simin ji bo alîkariya jinan û fêrkirina wan, ji bo pêkanîna debara xwe bi xwe di aliyê aborî de, dixebite. Tevî derfetên kêm Mala Jinan a bajarokê Til Simin bi erkên xwe radibe û cihekî xwe yê taybet di nav jinên herêmê de girtiye…** *ANHA*

## Parka 'Star' li Tirbespiyê hat vekirin

**Rêxistina Kongreya Star a navçeya Tirbespiyê bi merasîmekê parka "Star" vekirin. Rêxistina Kongreya Star a navçeya Tirbespiyê ya, parka "Star" bi merasîmekê vekir. Di merasîmê de bi dehan jin amade bûn.**



**Park ji aliyê dayika berxwedêr Semok Tirbespiyê û Gulan Herdem, Zeyneb Mûrad ve hat vekirin.**

**Dayîka herdu berxwedêran got: "Hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê, Kurd, Ereb û Suryan gavên mezin ber bi avakirina civakeke demokratîk ve diavêjin."**

**Rêvebera Kongreya Star Welîda Botî jî axivî û destnîşan kir ku jinên Rojava serkeftinên mezin bi destxistine û hemû jinên cîhanê re bûne mînak.**

**Piştî axaftinan, Koman Şehîd Xebat a girêdayî navenda Çand û Hunera Tirbespiyê stran û govend pêşkêş kirin.**

# Divê Şengal xwedî Statuyeke xweser be

***Konseya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera 4'an a Qirkirina Şengalê ku 3'ê Tebaxa 2014'an bi destê çeteyên DAÎŞ'ê hate kirin, daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku birîna Şengalê wê bi avakirina yekîtiya netewî bikewe. KNK'ê got, "Ji bo ku Şengal xwe biparêze divê Şengal xwedî statûteyek taybet û xweser be."***



Konseya Rêveber a KNK'ê destnîşan kir ku kewandina van birîn û kulan, birîna van êş û janan bi hevgirtiniyeke mezin ya neteweyî ya Kurdan dibe.
Konseya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera 4'an a Qirkirina Şengalê ku 3'ê Tebaxa 2014'an bi destê çeteyên DAÎŞ'ê hate kirin, daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin, şovenîzma Erebî, fanatîzm û kevneperestiya Îslamî di perspektîfa dijî Kurd û Kurdistanê de gihiştin hev û di bin kirasê DAÎŞ'ê de ji dergehê Şengalê ve êrişî Kurdistanê kirin.

### HEMÛ DAGIRKER KÊFXWEŞ BÛN

KNK'ê bi bîr xist ku Şengal warê qedîm ê civaka Êzidî ye û bi plan bû hedefa êrîşên DAÎŞ'ê.
Konseya Rêveber işaret bi kêfxweşiya hemû dagirkerên li Kurdistanê ji êrîşa DAÎŞ'ê kir û got, "Îran, Tirkiye û heta rêveberiya Bexdayê, rejima şovenîst ya Şamê bi zêdehî ve razî bûn. DAÎŞ bû pêşenga bîr û hizir û hisên antî Kurd û antî Kurdistan yên van navendên dagirkeriyê. DAÎŞ bû lolebkêşa sîstemên kolonyalîst ên li Kurdistanê. Bi vê êrişê xwestin hem destketên Kurdan li başûr û rojavayê Kurdistanê têk bibin û careke din nîrê kolonyalîzmê daynin ser stuyê Kurdan, hem jî ji aliyê teessubiya Îslamî ve baweriya Êzidîtiyê têk bibin. Lewma jî fermana qirkirina civaka me ya Êzidî dan."

### KURD JI BO ŞENGALÊ SEFERBER BÛN

KNK'ê diyar kir ku çiyayê Şengalê bilindahiya xwe kir stargeha civaka Êzidî û wiha dewam kir: "Ev kiryara encam trajîk ya jenosîda li ser xelkê me yê Êzidî, Kurdistan û dinya hejand. Kurd, Kurdistanî ji her milî ve çûne hawara xelkê xwe yê Êzidî. Bi taybetî gerîlayên HPG'ê, hêzên YPG û YPJ'ê qehremanî û fedakariyek mezin nîşandan, bi lezgînî mûdaxele kirin û pêşiya êrîşan girtin. Çi ji cepheyê sivîl ve, ji cepheyê leşkerî ve Kurd, Kurdistanî seferber bûn. DAÎŞ hate sekinandin û di serî da Şengal û cihên din ên Kurdistanê ji DAÎŞ'ê hatin rizgar kirin."

### JINÊN ÊZIDÎ BÛN SEMBOLA TÊKOŞÎNÊ

Konseya Rêveber a KNK'ê da xuyakirin ku li gel rizgarkirina Şengalê jî hejmareke mezin a Êzidiyan ji cih û warê xwe bûne û birîna 3'ê Tebaxê hîn dewam dike.
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin, "Hejmareke zêde a jinên Êzidî yên ku hatine êsîr kirin hê jî aqîbeta wan ne diyar e.
Ji ber wê jî vê bûyera xembar jina Êzidî kiriye sembola xebat û têkoşîna dijî kevneperestî, fanatîzm û zihniyeta reş ya îslamî. Herwisa hejmareke zêde ya xelkê me yê Êzidî di nav jiyana peneberiyeke dijwar de belav buye û ji bo başkirina jiyana wan jî divê xebatên neteweyî û navneteweyî bêne xurt kirin.

### BIRÎNA ŞENGALÊ BI YEKÎTIYA NETEWEYÎ DIKEWE

Mixabin hêzên ku lazimbû Şengal biparastina, hêzên wê demê li Şingalê bûn û ji parastina Şengalê berpirsyabûn, wan hêzan Şengal ne parast û ew jî bû sedem ku ev karesata mezin li serê gelê me yê Êzidî hat. Ev jî rastiyekî derdixe holê ku pêwîste hem Şengalî xwe biparêzin û hem jî xwe rêvebibin. Ji bo vê yekê divê di nava Kurdistanê de Şengal xwedî statûteyek taybet û xweser be."
Konseya Rêveber a KNK'ê destnîşan kir ku kewandina van birîn û kulan, birîna van êş û janan bi hevgirtiniyeke mezin ya neteweyî û niştimanî ya Kurd û Kurdistaniyan ve dibe.
Di dawiyê de wiha hate gotin, "KNK hêvî dike ku bîranîna vê jenosîda bi serê xelkê me yê Êzidî hatiye anîn, bibe sebebê tifaqa navxweyî û Kurd û hemû pêkhateyên Kurdistanê mil bi milê hev, welatê me Kurdistanê ji bin nîrê kolonyalîzmê rizgar bikin û azadiyeke kamil diyarî xelkê me bikin."

# Divê herkes piştgiriya gelê Êzidî bike

Kongreya Civaka Demokratîk KCD'ê, bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê ya 3'ê Tebaxa 2014'an peyamek weşand.
KCD'ê ji bo êrîşên qirkirinê yên li Şengalê got, "Şerm û sûcê herî mezin ê serdema me ye ku li dijî mirovahiyê hatiye kirin."
Daxuyaniya KCD'ê ya li ser mijarê wiha ye:
"4 sal berê di 3'yê Tebaxa 2014'an de bi teşwîq û parastina paşverûyên Rojhilata Navîn DAÎŞ'ê êrîşî cîh û warê pîroz û qedîm Şengalê kirin û li ser civaka Êzidî komkujiyeke mezin pêk anîn. Bi hezaran jinên Êzidî ji hêla çeteyên DAIŞ'ê ve hatin revandin, kirin kole, li bazaran firotin û bi îşkenceya zayendî-destdirêjiyê re rû bi rû man. Bi sedhezaran Êzidî ji neçarî cîh û warên xwe yên pîroz terk kirin û li Rojilata Navîn û Ewropayê belav bûn. Li wargehên ku lê hatine bicîhkirin di nava şert û mercên dijwar de dijîn. Zilma li Şengalê li civaka Êzidî û bi taybetî li jinan hatiye kirin sûcê mirovahiyê ye û şerma herî mezin a vê serdemê ye.
Civaka Êzidî ya li wargehên Bakurê Kurdistanê yên ji hêla gelê me û şaredariyên me ve hatibûn avakirin kêm be jî di nava jiyaneke baş de dijiyan. Bi taybetî piştî qeyûm şandin şaredariyên Bakurê Kurdistanê û hatin dagirkirin bi zext û zordariyeke gelekî mezin re rû bi rû man. Bi çavên biçûk li wan nêrîn, xwestin bi birçîbûnê wan terbiye bikin. Bi awayekî ku tolê ji wan hiltînin nêzîkî wan bûn.
Lê belê li gel komkujî û terora DAÎŞ'ê jî civaka me ya Êzidî ti carî dev ji berxwedanê, parastina xaka xwe û baweriya ku azad bikin berneda.
Bi berxwedan û têkoşîna bi heybet a hêza xweparastinê ya bi pêşengiya jinên kurd ên Êzidî hatiye avakirin, Şengal ji çeteyên DAÎŞ'ê hate paqijkirin.
Lê belê paşverûyên Rojhilata Navîn polîtîkayên xwe yên êrîşkar ên li hemberî Şengalê bi şêwayên din didomînin. Ev saleke amadehî û daxuyaniyên tifaqa AKP-MHP'ê û dewleta TC'ê ya li ser êrîş û dagirkirina Şengalê dane, encama vê yekê ye.
Civaka Êzidî li Şengalê bi hêza xwe û li ser vîna xwe rêvberiya demokratîk ava kiriye û ev rêveberî di serî de Tirkiye û paşverûyên Rojhilata Navîn aciz kiriye.
Li gel ku di ser revandina bi hezaran jinen Êzidî de 4 sal derbasbûne jî hê jî derbarê aqûbeta wan de ti agahî nehatiye girtin. Ji ber hê jî nehatine azadkirin şerma mirovahiyê ye.
Di serî de gelê me û hemû saziyên wê, divê hemû mirovahî bi gelê Êzidî re di nava tevkariyê debin. Ji wan bi fermanên nû re bi rû rû nehêlin li hemû qadên jiyanê di nava têkoşînê debin.
Em wekî Kongreya Civaka



Demokratîk, 4'emîn salvegera Komkujiya Şengalê û zilma dermirovahî ya li ser jinên Êzidî hat meşandin şermezar dikin. Em diyar dikin ku bi gelê xwe yê Êzidî re em di nava têkoşîneke hevpar de ne."

# *Êzidî dikarin xwe bi rêve bibin û biparêzin*

Tevgera Azadî diyarkir ku Şengal û civaka Êzidî bi felsefeya azad ya Rêber Ocalan û piştgiriya hêzên gerîla rêya jiyana azad ji bo xwe diyar kirine. Tevgera Azadî diyar kir ku Êzidî êdî gihiştine asta xwe bi xwe bi parêzin û rêve bibin û bang li hemû rêxistinên mafê mirovan kir ku piştgiriya îradeya gelê Êzidî bikin.
Bi rast hatina 3'ê Tebaxê êrîşa li ser Şengalê Tevgera Azadî daxuyaniyek nivîskî weşand.
Di daxuyaniya nivîskî ya Tevgera Azadî de hat gotin ku komkujiya 3'ê Tebaxê yek ji bûyerên herî mezin ya wijdana mirovahiyê hejandi bû.
Tevgerê got; "Ev êrîş di demek balkêş de pêkhat, wê demê hêzên hevpeymana navdewletî yên li dijî çeteyên DAIŞ'ê hatibû avakirin, herwiha ew navçe di aliyê rêvebirin



û parastinê de jî dibin destê çekdarên PDK'ê de bû. Wana jî gelê Şengalê di destê çeteyên DAIŞ de hiştin.
Hemû dîmenên reva çekdarên PDK'ê û komkujiya li ser jinan, zarok û revandin keçan hatîn dîtin, cîhan matmayî hişt."
Di daxuyaniyê de bal hat kişandin ser berxwedana hêzên gerîla ya ji bo parastina Êzidiyan û wiha hat gotin; "Gelên cîhanê hemû bûn şahidê dîmenek yê berxwedêr, ew jî berxwedana hêzên gerîlayên HPG û YJA Starê bû. Gerîlayan karîn hezaran Êzidî ji komkujiya çeteyên DAIŞ rizgar kirin û nehiştin çiyayê Şengal bikeve destê çeteyan û parastin.
Şengalî û civaka Êzidî bi piştigiriya şervanên azadiyê rêya azadî û jiyana xwe diyar kirin. Bi sedan ciwanên Êzidî bi felsefeya Rêber Apo rabûn, xwe di çiyayê Şengalê de perwerde kirin û karîn hêza parastina xwe ava bikin."
Tevgera Azadî di dawiya daxuyaniya xwe de got; "Niha piştî rizgarkirina hemû Şengal û dawî anîna çeteyên DAIŞ, Êzidî gihiştine wê astê ku êdî xwe bi xwe biparêzin û rêve bibin. Emê weke erkek yê exlaq û netewî hertim piştgiriya encûmena rêveberiya xelkê Şengalê bikin. Ji bo vê em bang li hemû rêxistinên mirovî dikin piştgiriya îradeya rêveberiya gelê Êzidî bikin."

## Çareseriya pirsgirêkan projeya Ocalan e



Mamostayê zanîngehê li başûrê Kurdsitanê diyarkir ku projeya Ocalan yekane projeye çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn e.
Nivîskar û mamostayê zanîngehê Hawjîn Emîn li ser projeya rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a Konfederalîzma Demokratîk ya ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn bi taybet pirsgirêka Kurd axivî.
Emîn balkişand ser kûrahiya şîroveyên Ocalan ên ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd û pirsgirêkên Rojhilata Navîn û got; "Ev fikirîna kûr peywendiya xwe bi hinek sedeman ve heye, yek ji van fikirîn û xwendina Ocalan a li ser dîroka mirovahiyê û dîroka Mezopotamya ye. Ezmûnek mezin ya Ocalan li ser vê yekê heye, ji ber vê ev bûye beşek ji projeyên çareseriyên mezin ji bo Kurdan û Rojhilata Navîn."
Emîn diyar kir ku projeya rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan yekane projeya rast ya ji bo çareseriya pirsigirêkên niha yên Rojhilata Navîn e.
Nivîskar Emîn li ser sedemê pêkanîna projeya çareseriyê ya Ocalan got; "Projeyên dijmin gelekin, ji ber ku ev proje li dijî berjewendiyên emperyalîzm û li dijî dewlet-netewa sexte û nasyonalîzmê ye. Ev dibin sedemê wê yekê ku projeya Ocalan neyê paşguh xistin. Biryarek giştî ya li dijî dûr xistin ji jiyana siyasî dîzayn kirina Rojhilata navîn heye. Nahêlin dengê Ocalan derbikeve ji derve. Ji ber ku projeya Ocalan tirs xistiye nava dewletên bi hêz yên ku cîhanê bi rêve dibin."
Di dawiyê de nivîskar Emîn diyarkir ku ger projeya Ocalan neyê pêkanîn dibe ku pirsgirêkek mezin ji bo van herêman çê bibe û got; "Ger proje neyê pêkanîn wê bi sedan pirsgirêkên dîrokî bi xwe re bîne."…***ROJNEWS***




# Tirkiye li Efrînê dagirker e

***Li gorî raporeke Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, şêniyên Efrînê dan xuyakirin ku binpêkirina mafên mirovan ên bi destê komên çete ên Tirkiyê ve tê kirin zêde dibin. Rêxistinê bang li tirkiyê kir ku tavilê dawî li binpêkirina mafên mirovan bîne û destnîşan kir, Tirkiye ku weke 'hêza dagirker bi nav dike' ji bûyerên li Efrînê diqewimin berpirsyar e.***



Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî diyar kir, li Efrînê ku hatiye dagirkirin mafên mirovan di asteke metirsîdar de tên binpêkirin û destnîşan kir ku Tirkiye a dagirker ji vê yekê berpirsyar e.
Li gorî raporeke Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, şêniyên Efrînê dan xuyakirin ku binpêkirina mafên mirovan ên bi destê komên çete ên Tirkiyê ve tê kirin zêde dibin.
Di raporê de hate gotin, "Hêzên çekdar ên Tirk van binpêkirinan ji nedîtî ve tên. Destgîrkirina bi kêfî, windakirina bi darê zorê, desteserkirin û talankirina malên welatiyan çend ji van binpêkirinan e."
Rêxistina Efûyê ragihand ku çete û hêzên dagirker ên Tirk dest danîne ser dibistanên li Efrînê û nahêlin ku bi hezaran zarok perwerdeya xwe bidomînin.
Midûra lêkolînên Rojhilata Navîn a Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî Lynn Maaloûf got, "Operasyon û dagirkeriya artêşa Tirk, êşa şêniyên Efrînê ku bi salan e bûne mexdûrê şerê kujer, zêde dike."
Rêxistinê bang li Enqereyê kir ku tavilê dawî li binpêkirina mafên mirovan bîne û destnîşan kir, Tirkiye ku weke 'hêza dagirker bi nav dike' ji bûyerên li Efrînê diqewimin berpirsyar e.

# Kongra Gel banga tevlêbûna çalakiyên 3'yê Tebaxê kir



Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA GEL, bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê ji bo çalakiyên 3'ê Tebaxê yên li çar aliyên cîhanê banga tevlîbûnê kir.
Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA GEL, bi wesîleya salvegera çaremîn a "Qirkirina 74'an" a 3'ê Tebaxa 2014'an li Şengalê li civaka Êzidî hate kirin daxuyaniyeke nivîskî weşand.
KONGRA GEL bi bîr xist ku ji bo şermezarkirina Qirkirina 3'ê Tebaxê û daxwaza qebûlkirina statuya Şengalê, wê li çar aliyên cîhanê çalakî bên lidarxistin û ji bo van çalakiyan banga tevlîbûnê kir.
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku Erdogan û tifaqên wî berpirsyarê sereke yê komkujiyê ye û PDK, Neteweyên Yekbûyî û saziyên navneteweyî jî şirîkên komkujiyê ne.
Di daxuyaniyê de hate gotin: "Bi destê çeteyên DAÎŞ'ê ku dewleta Tirk piştgiriya wan dike, 3'ê Tebaxa 2014'an li Şengalê qirkirina Êzidiyan a 74'an hate kirin. Em di salvegera çaran a vê qirkirinê de ne. Aqûbeta bi hezaran jin û zarokên Êzidî yên ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatine revandin hîn nayê zanîn. Neteweyên Yekbûyî û saziyên din ên navneteweyî tevî ku zanin Erdogan patronê DAÎŞ'ê ye, xwe li pêşberî vê yekê kerr kirin û polîtîkayên tinekirina Kurdan bi taybetî Êzidiyan ji nedîtî ve hatin. Lewma ev saziyên navneteweyî jî ji vê komkujiyê berpirsyar in. PDK'ê ku Êzidiyê li Şengalê bê çek û bê parastin avêt ber çeteyên DAÎŞ'ê, şirîkê herî mezin ê sûcê komkujiyê ye. Ev rastî bi ti awayî nayê nixumandin..

### EM XWEDÎ LI STATUYA ŞENGALÊ DERKEVIN

Hemû mirovahî û saziyên navneteweyî deyndarê civaka me ya Êzidî ne ku 74 caran ferman li wan rabûn. Li dijî zalimên ku dixwazin wan tine bikin, divê em wijdanan hişyar bikin û pêşî li zaliman bigirin. Lewma, di serî de gelên me yên Kurdistanê, dostên me û her kesên ji xwe re dibêje 'ez însan im', divê tevlî çalakiyên 3'ê Tebaxê yên li çar aliyên cîhanê bibin ku ji bo şermezarkirina qirkirinê û daxwaza naskirina statuya Şengalê wê werin lidarxistin. Em bang li gelê xwe û dostên xwe dikin ku bi xurtî tevlî van çalakiyan bibin."

## Emê weke welatiyên Şengalê vegerin ser axa xwe

Bi boneya 4'emîn salvegera komkujiya Şengalê, Meclisa Rêveber a Efrînê bi daxuyaniyekê komkujî şermezar kir.
Meclisa Rêveber a Kantona Efrînê bi boneya 4'emîn salvegera komkujiya Şengalê daxuyaniyek da û şehîdên komkujiyê bi bîr anîn û soza vegera Efrînê wek israra welatiyên Şengalê û Kobanê ya vegera warên xwe da.
Daxuyaniya meclisê wiha ye:
"Roj derbas dibin û êş û fermanên li ser gelê me li herêmê berdewam dikin. Beriya niha Fermana 73'yan li dijî kurdên Êzidî yên li Şengalê pêk hat. Beriya ku dîmenên êş û hovîtiyê di komkujiyê de bi dawî bibin, komkujî derbasî herêma Kobanê bû û di encamê de hate hilweşandin û gel koçber bû. Piştî wê careke din li welatê zeytûnan li Efrînê komkujî hatin dubarekirin. Ji Şengalê ber bi Kobanê û piştre Nisêbîn û Efrînê, komkujî yek e û ji heman jêderê pêk tê, her çi qas rêveber û aliyên ku van komkujiyan pêk tînin, cuda bin jî. Ev 4 sal



e di ser komkujî û êşa kurdên Êzidî yên Şengala berxwedêr re derbas dibin û hê jî gelek malbatên Êzidî li benda vegera welatiyên Şengalê ne. Em wek welatiyên Berxwedana Serdemê ya Efrînê ku em koçî herêma Şehbayê hatine kirin, careke din piştrast dikin ku kirinên li Şengalê pêk hatine hê jî li herêmê berdewam in. Tevî vê yekê welatiyên me yên berxwedêr hê jî di berxwedana xwe de bi israr in û li benda vegera warên xwe ne.
Em soz didin gelê xwe li herêma Şehba ku çawa gelê me li Şengalê û Kobanê bi israr vegeriyan warên xwe, em wek welatiyên Berxwedana Serdemê ya Efrînê li herêma Şehbayê di berxwedana xwe de ji bo rizgarkirina Efrînê bi israr in."

## Mirovahî deyndarê Êzidiyan e

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Êzidiyan a 3'ê Tebaxa 2014'an daxuyaniyek da û got, "Her kes bi navê mirovahiyê deyndarê Êzidiyan e."
Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand, mirovên di Qirkirina 3'ê Tebaxê de jiyana xwe ji dest dan bi bîr anî û ji bo jin û zarokên hatine revandin jî got, ew "sonda têkoşînê" ne. KCK'ê destnîşan kir ku dawîanîna li fermanên li ser Êzidiyan tê wateya qedandina komkujî û zextên li ser hemû gelên Rojhilata Navîn.
Daxuyaniya KCK'ê wiha ye:
"Civaka me ya Êzidî ji ber ku xwedî dîrokeke qewîn e û yek ji civakên qedîm e, li gel 74 fermanan, yanî komkujî û qirkirinan hebûna xwe parastiye û xwe gihandiye vê serdemê. Êrîşa li dijî civaka Êzidî êrîşa li dijî rabirdûya Rojhilata Navîn e. Lewma ev yek xiyaneta li dîroka Rojhilata Navîn e. Ji ber vê yekê, Rêber Apo xwedîderketina li Êzidiyan weke xwedîderketina li hemû gelên Rojhilata Navîn bi taybetî gelê Kurd dîtiye û berpirsyariya li pêşberî Êzidiyan jî weke deynekî mirovahiyê nirxandiye. Her kes bi navê mirovahiyê deyndarê Êzidiyan e. Hemû mirovahî bi taybetî jî Kurd, bi parastin û ewlekirina ziman, çand, bawerî, hebûn û nasnameya



Êzidiyan dikarin vî deynê xwe bidin. Ev yek jî bi afirandina jiyaneke demokratîk û azad a ji bo Êzidiyan dibe. Ji bo careke din ferman li wan ranebe, Êzidî dixwazin li ser axa xwe bi xweparastin û bi rengekî xweser bijîn. Ji bo vê jî weke civaka demokratîk a rêxistinbûyî hewl didin xweseriya xwe pêk bînin..
Fermana 74'an a li Êzidiyan rabû dikeve sala 5'an. Di sala 5'an de wezîfeya dikeve ser milê gelê Kurd û hemû mirovahiyê ew e ku xwedî li jiyana xweser a Êzidiyan derkevin û destekê bidin wan. Eger Êzidî li ser bingeha xweseriyê bibin xwedî jiyaneke demokratîk û azad, wê Başûrê Kurdistanê û Iraq jî bibe xwedî jiyaneke demokratîk û azad.
Di salvegera fermana 74'an de em bang li gelê Kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn dikin ku têkoşîna azadî û demokrasiyê geş bikin û li Rojhilata Navîn ku cih û warê exlaq, wijdan, edalet, wekhevî û heqaniyetê ye, jiyana azad û demokratîk biafirînin û vê derê ji nû ve bikin erdnîgariya şaristaniya demokratîk a mirovahiyê."



## Îxanet, hevkarî û komkujî didomin

Mihemed SEYDÎ

Devera Şengalê, wekî bajar û herêm navenda herî girîng ya Êzidiyane.
3'ê tebaxê 2014'e dîroka rûreşiyeke din a mirovahiyê ye. Dîroka îxanet û qehremaniyê jî li vir careke din xwe da holê û rûyên heyî maskeyên li ser xwe avêtin.
4 sal di ser komkujiya şengalê re derbas dibin, şengal rizgarbû lê civaka êzidî birînên xwe hîne jî nepêçane. Ji ber heta niha gelek jin û keçên êzidî di destê Çeteyên hov de dîl girtîne.Dîmenên wê rojê û rûreşiya hêzên li wir di hiş û bîra me de aliqî mane, bi taybet jî gelê Êzidî yê di nava pençên qirkirinê de hate hîştin. Pêşmerge reviyan û gelê êzidî li ber wê hovîtiya çeteyan him jî dijwariya germa havînê de bê çek, av û xwarin hatin hiştin. Yên destwerdana vê rewşê kirin û bi hawara Şengaliyan ve çûn gerîlayên PKK û zarokên kurd ên di nava tevgera azadiyê de bûn. Bi hezaran kes rizgarkirin û bi riya koorîdorên ku Yekîneyên Parastina gel YPG vekirin ew ji wê wehşiyetê xilas kirin.
Rev, îxanet û li rex wê jî qehremanî wiha bû.
Em bên roja îro dîsa heman hêzên ku li ser gelê êzidî bazar kirin, bi çeteyên DAIŞ û dewleta Tirk re hevkarî kirin û êrişa şengalê organize kirin heta niha vê riya xwe ya Îxanetê didomînin.PDK'ê bi helwestên xwe yên li ser dagirkeriya dewleta Tikr li ser başûr kurdistanê jî vê hevkariyê zelal dide ber çavan û eşekere vê yekê dike. Rojane çawa ku Şengal hate wêrankirin niha gund û herêmên başûrê kurdistanê rastî bomberanarê tên û ev jî bi erêkirina Rêveberiya başûr di sêrî de partî demokratî kurdistanî ku pêşmergeyên wan li şengalê li pişt erebeyan siwardibûn û direviyan pêk tê. Dîsa PDK'a ku şengal radestî DAIŞ'ê kir heta roja îro êrişên xwe yên li ser rojavayê kurdistanê didomîne û ev yek bi rûyê wê yê li rojava bi navê ENKS'ê ku ket pêşiya dewleta Trik û heta niha komkujiyên ku rûyê DAIŞ'ê yê rast yanî dewleta Tirk li Efrînê pêk tîne hemû bi pêşengî û rênîşandana wan endamên ENKS'ê pêk tê.Dîsa Çete û leşkerên dewleta Tirk li Efrînê jî kuştin û revandina êzidiyan didomîninm cihên sembol û beweriya wan wêran dikin.
Herî dawî ji bo ku çareseriyek li Sûriyê pêk were û gelê kurd bibe xwedî hêz û mafekî rewa yê xweseriyê hevdîtin di navbera Meclisa Sûriya demokratîk MSD û Rêjîmê de pêk hat û li ser hin mijaran dîyalog hat destpêkirin. Lê PDK-MÎT'ê dîsa xwestin tiliya xwe bixin meselê, yekser ketin dewrê û berê xwe dan Şamê û hewldanên xwe yên xirabî û fesadiyê kirin.
Bi van hemû hewldanan re jî komkujî û felaket hatin serê gelê li herêmê hîne jî tên. Lê ya sosret ew e ku heta niha civaka navdewletî li hemberî van komkujiyan bê dengiya xwe dewam dike û ji bo dawî li van çeteyên ku niha dewleta Tirk li Idlibê dixwaze nave wan bughere û rûyê wan sipî bike ti gavan navêje.
Dîsa komkujiya ku beriya çend rojan li Siwêdaya başûr Sûriyê pêk hat û DAIŞ'ê girt ser xwe û dîsa hêjmarek Jin dîl hatin girtin wênaya ku di 3'ê Tebaxê li Şengalê pêk hat nîşan dide. Yên ku li hemberî komkujiya li şengalê bêdeng bûn û heta niha NY ku wekî Jînosîd pênase nekiriye wê ji bo rê li komkujiyên nû yên weke ku niha li Efrîn û Siwêdayê li ser gelên herêmê pêk tên bibin xwedî helwest gelo? Ev hêzan çi girtine û çima ji bêdengiya xwe ya ku rê li komkujiyên mezintir bigre dernakevin?
lê xwazî ku zimanê Şengalê û gelek deverên komkujî lê pêk hatin hebûya, hesab ji mirovahiyê bixwasta, behse rûreşî û îxaneta PDK ya 3'ê tebaxê bikira û bêbextiya cîhanê baniya ziman.